# Silav,

Em li te digerin yê baweriya te bi azadiyê, wekheviyê û piştgîriyê te. Em mereq dikin, gelo tu dixwaze bi me re bo lêkirina Swêdeka bêhtir adil? Bi hev re em karin awa bidin…

…socîaldemokrasiya pêşerojê û dijberiyeke xurt pêşkêşî siyaseta burjûwa bikin. Tu bixêr bê wekî endam-bêhtir bixwîn di socialdemokraterna.se de. Bi hev re em karin guhertinê çê bikin!



SOCIALDEMOKRASÎ TEVGEREKE AZADIYÊ YE. Siyaseta me derbarê wê ye ku her kesek divê karibe biryara hilbijartinên jiyana xwe bide- kar, duristkirina malbatê, belkî wê xwendina di xewnên xwe de bixwîne-ku karibe macera jiyana xwe rast bigerîne.

Azadiyeke rast wekheviyê ferz dike. Di Swêdekê de ku cudabûna navbera yên feqîr û yên dewlemend bêhtir dibe û cudatîkirin bi serê mirovan de tê, azadî kêmtir dibe. Ji gir- ingtirîn karê siyaseta me ew e ku em bo her kesî, eger ne tenê bo çendeka, imkan bidin ku bi awayekî baş jiyanê derbas bikin. Dîtina te wek ya me ye?



# Em dê çawa bikin?



# Ev derbarê çi ye?

BI ALÎKARIYA MEZINBÛNEKE xurt û zêdebûna derametan em dixwazin cudabûna sinifan kêmtir bikin, cudabûna hatiniya bi paş de vegerînin û civaka refahê xurtir bikin. Ev derbarê hewldanan e bo peyda kirina karên bêhtir, ji ber kesek wisa neserbest tune wekî ew kesê bê karekî xwedî kirinê. Ev derbarê hewldanên di warê tenduristiyê de û lênerîna kalûpîran de ye, bo ku kesek his neke bi bêaramiyê ew roja bi pêwîstiya civakê bibin.

Û ev derbarê lêkirina sîgorteyên ewleyîyê ye, bo ku ew kesên di nav me de yên bêkar dibin yan nexweş dikevin bi awayekî zû û baş alîkarî bi wan re bên kirin bo vegerin wekî berê. Ev derbarê ku em hemû bi berpirsiyariyê rabin û alîkariya vê gişî bikin bi rêya bacnameyê. Ji ber kesek feyde nake ku kesek li paş bimîne. Piştgîrî bi cîlên bê re û bi mirovên cihanê tevî re dihêle ku em bi xurtî bi pirsên avûhewayê û karê neteweyên yegirtî re eleqdar bin. Tu dixwaze beşdar be û tasîrê li siyastetê bike?

AZADÎ, WEKHEVÎ Û PIŞTGÎRÎ NIMÛNEYÊN BAŞIN yên me socialdemokratan bi rê ve dibin. Em siyastetê nû dikin û baştir dikin herdem. Em çiqasî bêhtir bibin yên alîkarî dikin bi hizir û xibretan em dê baştir siyaseteke biafirînin bo pêşerojê.

Li ba me tu kare eleqdar be bi gelek awayan. Hindek diçin hemû civînan, û hindek kêm car diyar dibin. Çendek bêhtirîn çalakdarin di şebekeya komputerê de, û hindekê din di cihê karê xwe de. Ji her kesî re derdikeve ku beşdar be û tesîrê bike bi awayên xwe. Tu her dem bixêr bêyî!

Rêxistina partiyê ya herêma te kar e bêhtir ji te re behs bike. Di gelek deverên welat de jî perwerde hene yan çalakiyên taybetî bo endamên nûhatî.



# Tu dixwaze beşdar bibe?



# Hewesên te çi nin?

TU HER ÇAWA ELEQDAR DIBE em karin sozê bidin te ku tu dê siyasetê şîrove bike, mirovên nû nas bike û demeke xweş derbas bike!

Eger hewesên te yên taybetî hebin rêxistinên partiyê yên kêlek kare balkêş be bo te. Socialdemokratên genc dicivin di SSU de, bo socialdemokratên xiristiyanî Broderskap heye û bo xwendevanên socialdemokratan S-studenter heye. Navê yekîtiya jinan ya me S-kvinnor e.

Were bi me re, gavê bavêje. Bibe endam.

Xwe binivîsîn di socialdemokraterna.se ê de yan formê dagire!